JI PIŞT DERÎ WERE DER

Cola Hacî

Şeveka dereng e
Hemû tişt dinamone
Gulopa li hindav min defterka şiîrên min...
Hemû dynamo ne!
Destên min girê rogeha xwe di asoyê xurbeta te de vemirandiye
Çiye?
Xeric e bêhna te xwe
Ji gulav û
Lewendî û mercanên min bivedizit
Tîşêrtê te yê portaqalî
Gizîlankên min vedikit
Hêşta otîyê wî têk neçûye
Tibil
Û desmala min
Pelatînkeka ne hecim tine
Ne Xanî û ne jî Cizîrî
Bo stirîne
Bo xwîra çi xêvzanka hêşta dest bo neweşandiye
Çend sar e
Ware qama te lê neçemiyayî!!
Mêyatiya min bo te digerit
Hewceyiya min bi gerdena t eve ya çeqa digirit
Min digel seferên xwe yên kurt xayen bigerîne
Dilê min, bi lojîka eşqa xwe bisoje
Di karîzma şevên xwe yên tenik de digel vînosê binvîne
Buharê di me bialîne
Tu bêjî baranê tama peyasên me fir nekiribit?!
Ji pişt derî were der
Tiblên min bila çînganê li bin guhên te bikin
Maçên me li ser beyiskên heza dila biwerînin
Bexçevanên lêvên min bila Tiriyê rezên lêvên te biçinin
Çavên min
Şajina rûbarên te yên namo
Di xew bibin
Şevê dî bû min û te û sînahiya mûmeka
Werîsê mirinê li hefikê

Bo agirekê serxweş dikirin pabos!
Noş bo hatina te
Noş bo mana min
Pêlên xurbeteka asê
Bila te ne hingêvin
Min jî digel xwe bibe
Ez ya li ber derî û stûvanka te awa hêşta demê ez û tu
Bo hembêza Enahitayê disotîn
Mora li min dikit
Min ji xwe re bibe Laliş
Di ava qudretê de
Birayêxe
Şehdeya min bistîne
Li rex darka Mirada
Mohra dezgiriya me çêke
Biskên min veke û
Bi viyana xwe ter bike
Rûyê min bide bayî
Her şev were pişt kavilkê me
û sîbera xwe bike elind
Bo hevsoyên me bêje
Yara te me!
Navê min
Li ser dîwarên hewşa xwe û digel şitla biçîne
Digel nêzîkbûna rîtma te
Dê xunavê ji xwe vemalim
Ji pişt derî were der
Min ji xwe re bibe navdanga kêliya şedayê
Patê heyê kesk ji min veke
Min zindî bike
Tara hinarka hel bide
Û min bê mirad neke!
Min ji xwe re bibe
Hewreman
Bi siya çamana ve min sikêç bike,
Miska pirça min ya dirêj di dest xwe bigire!
Nextekî li ba min pal bide
Singê giyayî bi sema xelweta me bigevizîne
Ta elemka ji min bibe
Kesek maye te negotiyê tu hez ji min dikî?!
Roj çend di kurt in
Nagehim davên xwezîka bigirim.
Xenda divejêrim
Hewceyî te me…
Ji pişt derî were der
Û
Nehêle xewnên min bigenin
Bo têhneka pîvaziya çavên te
Ezman sorik
Min li pişt çavên xwe siyar dikin
Nahêlin çîtir xewna bibînim
Stêra bihejmêrim
Wênên te yên di boxçika min de wexmê girtîn maç bikim
Bêjim
Ya te me!.